


Rijêma Derebegî Li Ewrupa Di Serdema Navîn Da



Dr. Zahîda Muhemed Mizûrî

Rijêma Derebegî

Vekoleran navê (rijêma derebegî) li ser sazî yên abûrî û civakî û ramîyarî yên li serdema navîn li Ewrupa rojava û li geleg dewletên Ewrupa rojhelat dibelav danayne.

Cudahî di derbarey ramandarîya dîrokî ya ramana derebeg da li navbera vekoleran heye. hene dibînin, ko derebegî ji bilî qûnaxekê pêvetir nîne, millet di çaxê pêvajo



ya xwe da berev pêşkeftinê ji berhemhîna koletîyê berev qûnaxek bilindtir têra derbaz dibin. her wesa hene dibînin, ko derebegî serboreka kirîyarî ye, rûdanan wek pêguhorka hukmetên navendî sepanî ye, dako hindêk tenahî bidest ve bihêt.

Belê ramana yasayî ya derebegî yê, nîşan bi hindêk sîsteman diket, ko li ser mêrê azad di warê dwîvelankî û xizmetê da diket, nemaze dibwarê cengî da mêrê azad ji bo azadek dî (begî) diket, ewê pêgîrî parstina tagirê xwe diket û mezaxtinê lê diket û ew ji begî dixwazît parçek erdî bi wî bidet, ew bi bexşîn hatîye bi navkirin (ko di zimanê Erebî da bi "aqtai" hatîye binavkirin)

Binîyat û Rehrîşalên Rijêma Derebegî

Li dumahîkên serdema komarî romanî sîstemê çavdêrî û parastinê naskirbûn û ew sîstem di serdema empiratorî da berdewam bû, destpêk ji çerxê zaynî kedxudayên biçûk yê azad daxwaza parêzvanîyê ji kedxudayên mezin (pêtiron=derebeg)an, ewên di heman çaxî da karên bilindên dewletê hebûn kirin. daxwaza parêzvanîyê bitinê li ser hejar û kedxudayên biçûk nerawestîya, lê belê berfrebû, heta



hindek ji fermanberên parêzvanîya fermanberên mezin yan empiratorî dixwastin, dako dikarên xwe da bilez bilind bibin. Belê karpêkirina bi sîstemê derebegî li dumahîkên serdema empiratorîya romanî bi taybetî li deverên rojava pitir dîyarbû, li serdemên Mîrofrengî û Karolîngîyan taybetmendîya xwe pitir wergirt, heta li navbera çerxên dehê û yazdê bi germtirîn hêza xwe gehişt, li van herdu çerxan sazîyên derebegî li pişkên Ewropa rojava, bi taybetî li pişkên bakûrî û rojhelatê Ferensa û pişkên bakûrê elmanîya û li berîtanîya belav bû, li heman çaxî çerxên didwîvra ji ewê dîrokê bi qûnaxên guhartin û veguhastina sazî yên derebegî ji ber pêşketina bazirganî û çandinê û pêşesazî yên li wî demî bi ser kîşwera Ewropa da hatî dihête hijmartin.

Pêkhatên Rijêma Derebegî

Sazîya derebegî li Ewropa di serdema naverast da, ji sê regezên serekî pêkdihêt, ew jî:

Êkemîn: Sîstemê Tagirî Yê:

Sîstemê tagirî yê di derebegî yê da, piştbestinê li ser du

erkên serekî diket; ew jî (milkeçî û wefadarî) ne. merem pê, ko li ser kesê tagire milkeçî fermanên baxuyê xwe bît û milkeç û wefadar bît û tagir li beramber wê; ji baxuyê xwe bexşînê bidestve diîbnît, ko behra pitir parçeka erdî bûye, ji ewên cotîyaran dikirin û li beramberî wê çendê behrek dîyarkirî ji berhemî û zêdebarî xizmetên dî bi baxuyê xwe di bexşî.

Li destpêkê bexşîn pêdanek berwext bû, girêday jîyana wî kesî bû, belê di serdema empator Şarlê keçel (875- 877) da, berev pêdana pêmayî (wîrasî) hate guhartin, ji ber ko ewa divî kawdanî da pê dima ne erdê vebirî bû, belê ew mafek rewayê bidestvehînanana erdî û mifajêkirina wî, bi mercên dîyarkirî bû; ko kurê mezin yan mîratgirî mafê rewa nîne pêmayê babê xwe bidestvebînt, heta sûnda wefadarî û alîgirîyê bo baxuy nexut û pêgirî xizmet û erkên derebegî yê li ser wîne nebt, eger hat û tagîr mir û çî mîratgirên nêr yan mê nebin, ew erd ji bo baxuyê derebeg dimînt û ew erd bi (mîrî) dihête binavkirin.

Li dumahîka serdemê derebegî dîyardeka balkêş dibwarê mîratgirîya erdî (sermîyanî) da dîyare, ew jî dîyarda (parvekirina dûndehî) ye, anko li berçavgirtina



berijewendîya mîratgirên mayî, ko rêk bi wan bihête dan, ko dahatên erdî li ser hemûyan bihêt parvekirin, bi mercê mezintirîn û pêgehiştîtirînê wan berpîrsîyarîya parstin û êkgirtina navçê (yan deverê) wergirît, piştî li beramberî baxuyê xwe (derebegî) erkên tagirî û wefadarîyê encam didet.

Maf û Erkên Derebegatîyê

Derebegî li ser binemayê peywendî yên kesatî, yên girêdayî hebûna (yan xudanîya) erdî hatîye avakirin û erkên li ser tagirî li beramberî baxuyê wî mişebûn, ew jî:

1- **erkên leşkerî:** ewên li gor hevkarîya li qada cengê ava dibûn, bi ankoya ew beroka serekî ya peywendî yên derebegî ye dinavbera baxuyê û tagirên wî da, li destpêkê xizmeta leşkerî ya tagir bo baxuyê xwe diket nehat bû dîyarkirin; belê li çaxê hêrşên fakîngan li ser rojavayê Ewropa dijwarbûyn, li ser tagiran hate sepandin herdema baxuyê wan yê derebeg fermankir, bê merc, ji bo helgirtina çekî di berhev bin.

Her wesa digel erkên leşkerîyê yên tagir ji bo baxuyê xwe diket, nûbedarîya kelha yan asêgehîya baxuyê xwe bû,



ewan tagiran bi dirêjîya salê doranê li ser nûbedarîyê dikirin. belê demê li ser tagirî sebandî, ko pêdivî bû tagir bitinê li navbera sîh heta çl rojan nûbedarîya kelha baxuyê xwe biket.

2- **erkên samanî:** ew harîkarîyên tagiran, bo baxuyên xwe pêşkêşdikirin bexşîn bûn û bi rengê xelat dihatin dan, heko rijêma derebegî cihgir bûy, êdî ew harîkarî jî bûne pêgirî û li helkeftên dîyarkirî dihatin pêşkêşkirin û dinav wan pêgirîyên samanî da: şirînî yan bawerpêdan bûn, ew baceka samanî bû, herdema mîratgirek nû ji kur û nevîyên tagirî ew erd werdigirt, bi yaxwê dihatidan.

Her wesa piştevanîya (oksîlîom), ew bacek bû tagirî li helkeftên taybet bi baxuyê xwe dida, ji wan civandina qelenî ji bo azadikirina baxuyê, eger hatedîlkin û xelatkirina kurê mezinê baxuyê, dema dibîte swarek danpêdayî û şahîgêrana hevserbûna kiça mezina baxuyê biken û pişkdarîyê di cengên xaçperêsîyê û avakirina asêgehî yê nû da biken, piştevanî li ser du pişkên serekî dihate parvekirin:

1- ew piştevanîya baxuyê derebeg li ser tagirên xwe di sepînêt, bi gorey tîtalan wek mafek negore.



2- ew piştevanîyên baxuyê ji tagirên xwe dixwazit, bêy ko ew têda di neçar bin, zêdebarî erkên mêvandarîyê, heko tagir pêşwazîya baxuyê xwe diket û raxstina şîlanê li dema seredana wan diket.

3- erkên civakî: ew pêgirîne; heko ji tagirî dihête xwastin, ko li ser kîstê xwe yê taybet li bingehê baxuyê derebeg berhevbit, ew ji bo pêşkêşkirina amûjgarî û rawergirtina baxuyê xwe, baxuyê derebeg tagirên xwe di civatekê da bi navî (konsîlîom) di civandin, dako li dor babetên giştî, bi taybetî li demên ragehandina cengê; çî navxweyî yan derveyî bi wan bişewirît.

4- erkên sincî: ew jî bi vî rengî bûn; ko bi (aqil, cihê bawerê, destpak, çak, rewîşt vekirî û bisanehî bit).

Erkên: Baxuyê Li Beramberî Tagirên Wî

Ji giringtirîn erkên baxuyê li beramberî tagirên wî, ko parêzvanîya wan biket û li demê toşî destdirêjî yê dibin, berevanî yê ji wan biket, berevanî jî çî bi çekî yan bi piştevanîya samanî bit yan me'newî li beramberî dadgehê, her wesa li ser baxuyê bû di karubarên wanên taybet û giştî da amûjgarîyan li tagirên xwe biket û dadwerî yê di nav wan



da peyda biket. her wesa ji erkên wî ew bû jîyana tagirên xwe û rûmeta binemala wî di saxî û piştî mirna wî da biparêzît, girintîya erdê tagirî biket hindî ew ji pêgîrîyên xwe dûr nekevît, her wesa rêkê bi tagirî bidet, ko gazinda xwe bi baxuyê baxuyê xwe bigehînît, eger hat û dît baxuyê wî çewsandin û stemkarî yê lê diket.

Duwemîn: sîstemê gundîyatî

Ji ber ko sazîya gundîyatî yê ji bo reh û rîşalên romanî û germenî vedigerît, li demê giringîya bajêran nemayî û bazirganî lawazbûy, ev sîsteme li Ewropa rojava bo binîyatê jîyana abûrî ava bibû. romanan sîstemê gundîyatî bi hevguhartina bazirganî digel bajêrên bi vejen dinasîn, gundan berhemê xwe yê çandinê di şandin bajêran û berhemê pîşesazî ji wan dînan. belê li çerxên navîn gund bi tena serê xwe bûn yekeyeka abûrî û çî girêdan bi alî yên dî ve nema û li ser xelkê wan bû piştbestinê li ser xwe biken.

Yekeyên Berhemhînana Derebegî Li Gundan

yekeyên serekî ji bo berhemhînanê di sazîya derebegî da, li ser sê cwînan parve dibin, ew jî:



li qûnaxa navîn ji serdema :cwîna koleyan :A
li (z` 200 - 100) li navbera ,naverast Ewropçîna kole ,a
gelek ji cotîyarên azad û benîyê ,n çandinê dikêmtirbûn
ji ber karê koleyanbitinê li nav malan û karê çandina li
erdên hindexbaxuyê.yan bû

Digel borîna demî, li çerxê yazdê, rêjeya koleyan li
Engltera li kêmê da, çunko pitirîya wan bo benîyên erdî
hatin guhartin û li çerxê sêzdê koletî nema, belê bi dirêjîya
serdemên naverast ew li Espanîya û Îtalîya û başûrê
Ferensa mabû.

B: cwîna cotîyaran: ew cwîneka kêma bûn, li gundên
ewropî, hijmarek kêma cotîyarên azad hebûn, ewên
parçên biçûkên erdê çandinê hebûn û maf hebûn bifiroşin û
erdên dî jî bikin. pitirîya cotîyarên azad tagir bûn û baca
erdî bi baxuyê yên xwe yên derebeg didan yan pêgîrbûn li
gelek kaudanan (ji bilî leşkerîyê) gelek corên xizmeta ji bo
wan biken û ev azadên henê girêdayî baxuyê deverê bûn,
ewê desthelata wî ji şahî dihat

Ev cotîyarên azad di barûdoxek dijwarê abûrî û civakî da
dijîyan, ew bû eger, ko pitirîya wan berev cwîna benîyên
erdî hatin guhartin, ji giringtirîn hokarên cotîyarên azad



berev benîyatîyê birîn, ne pişkdarîya wan li cengên derebegî û xwe nefrotina ji bo parstinê yan xwe bexşîna bi sazîyê olî bûn.

C: Cwînê benîyan yan koleyên erdî: evî cwînî rêjeya herî mezina çîna cotîyaran li ewropa rojava pêkdihîna, benîyatî di zimanê mêjûya abûrî da, qûnaxeka pêşkeftîya navîne di karê koletî yê da û ew karek azade; cotîyar dinav parçek erdê girêday xwe da dijît, belê ew neşêt wî erdî bihêlît, ji bî ko birevît yan eger baxuyê wî razî bît, azadîya xwe bkirît, her wesa baxuyê neşêt wî der biket, ji bilî ko ew razî nebt erkên xwe yê yasayî encam bidet yan gunehê biket.

Erkên Benî Li Beramberî Baxuyê Derebeg

Ev erke li ser çar pişkan parve dibin, ew:

1- xizmet: karên zibarê, ewên baxuyê li ser benî yê xwe danît û sê cor bûn, êkemîn: zibara heftîyane; li ser benî bû sê rojan li nav erdê baxuyê kar biket. duwemîn: zibara werzî; li ser benî bû li demên çandin û durînê kar biket. sêyemîn: zibara giştî; li ser benî bû di vekirina rêka û kolana kenala û avakirina piran da kar biket.

2- serane: ew bacek samanî bû, wek nîşana benîti û tagirî



yê dihate wergirtin. baca dehêk: ko ji deha êkê ji berhemê danî û pencaran (xezrewat) û ji deha êka berhemê tersî û masî û firndan pêşkêş biken.

3- pawankirtin: baxuyên derebeg, hindek sazî; wek aş û nanpêjî û parizînge (maser) ji bo xwe digirtin û li ser benîyan bû karpêra biken.

Li dumahîka çerxê yazdê, hêdî... hêdî çîna benîyan nema, nemaze piştî hewên xaçperstan li (1095-1099z) dergeh li ber benîyan vekirin, ko pişkdarîyê di wan hewa da biken û erdên xwe bihêlin, her wesa avabûna bajêran û pêşketina wan li bwarên pîşesazî û bazirganî dergehek li ber benîyan vekir, da ko ji wî erdî koç biken û berev wan bajêran biçin, nemaze piştî mezine kedxudayan benî yên xwe bi tevayî azadikirîn, heko dîyarbûy piştbestin li ser keda benîyan neya abûrî ye û bo wan baştîre paleyên kirêgirtî yên çandinê bikarbînin. belê di ser hindê ra sîstemê benîyatîyê li seranserî Ewropa li çerxê sêzdê her mabû, lê belê li wî demî berev dumahîka xwe çû.

Sîstemê Swarîyê

Navê swar, li erkê leşkerê ji swarbûna pêrehan dihêt û



ew kêmtirîn pileya zincîra derebegî ye û sîstemê swarîyê girêdanek mikum bi sîstemê derebegî ve heye.

Li destpêka çêbûna rijêma derebegî, caran benî di çûne dinav rêzên swaran da, bi mercekî şîyanên xwe yên guncay bi sepînin, belê paşî yasayên derebegî bi fermî wergirtina benîyan wek swar qedexekirin û heta dumahîkên çerxên navîn, bitinê kurên beg û mîran ew daxwaz dikirin, bi nasnavê swarçak dihatin xelatkirin, eve ji ber binemala wan bû.

Qûnaxên Pêgehandina Swarî

Pêgehandina swarî bi sê qûnaxan dihatekirin û her qûnaxekê nasnavekî dîyarkirî werdigirt, ew jî:

Qûnaxa êkê: zarok li jî yê heft salî ji mala wî dihête dûrkirin û bi rêdikene seraya baxuyê derebeg û hevalê babê zarokî, eger zarok kurê êk ji begên mezin ba bo koşka şahî dihate hinartin, dako şarezayîya jîyana orustukirasî wergirît û rêz û rewştên civakê xanedanan fêr bibit û zarok li evê qûnaxê nasnavê (berhev) werdigirît.

Qûnaxa duwemîn: ev qûnaxe navbera pazde salî û heta bîstê ji jîyê zarokî vedigirît û têda zarok digel swarekî



dimînît û digel wî digerît û xizmeta wî û çek û hesipê wî diket, her li wê qûnaxê zarok fêrî swarî û bikarhînana çekî dibît, li vê qûnaxê pileya zarokî dibîte (harîkarê swarî) û her wesa bi (helgirê zurî) dihête binavkirin

Qûnaxa sêyemîn: li evê qûnaxê harîkarê swarî şûrî û rumê werdigirît û digel hevkûfên xwe yên genc bo cengê dihête rahînan û rahînanê li ser bikarhînana çekî û tîrhavêjîyê diket û her wesa digel swaran pişkdarîyê di hindek cengan da diket, ger şîyan û pêvehatina xwe çespand, ew dî bi swar hête damezrandin û eve li bîst salî dibît, nasnav û pileya swarî li şehîyanek ayredî ya taybet dihêtedan û bi (şahîya helgirtina çekî) dihête binavkirin.

Erkên Sincî Yên Swarî

Li ser swarî pêdivî bû, xudan rewştek sincî yê dîyar bît, çunko swarçakîya derebegî (li ser binemayê tagirîya baxuyê) ava bibû, ji swarî dihate xwastin, ji bo baxuyê xwe wefadar bît û bi mêranî û zîrekî ji ber wî bicengît. serdarê çeleng divîya xweragir û bîrmend û hişîyar bît, digel da jî mêrxas bît û ko ji tîtalên swarçakî yê bû, şerê swarê yan şervanê bê çek neket, tîtalek hebû, swarçakê dîl, dikirin



mêvan û rêk pê didan; kurê wî bibîte barmite (rehîne) heta ew baca dîlbûna xwe komdiket, li çerxê sêzdê tîtalek hebû swarê dîl berdidan, da bikarît baca dîlbûna xwe bicivînît, ger neşîya wê bacê xirvebiket ew bixwe li dîlbûnê vedigerîya.

Belê swarçakîya olî, ew têgehê perstgehê ji bo swarçakê nimûneyî ye, ji swarî dihate xwastin, ko mesîhîyek teqwa bît û merema wî ya serekî parstina perstgehê bît û berevanîyê ji bawerîya wê biket, her wesa perstgehê jê dixwast, ko ji kirina hemû corên gunehkarîyan dûrkevît û çavdêrîya belengaz û bêçareyan biket û wan biparêzît.

Li naverasta çerxê yazdê li başûrê Ferensa, helbestvan xuya bûn, navê (Trobador) li xwe kirin û di helbestên xwe da bi cwanîya xaniman distiran, êdî swarê evîndar hizir li tiştêkî nedikir, ji bilî li erdê wê kar biket û bextewerîyê pê bidet. ne her tinê helbestvanên Trobadorî bi xaniman digotin, lê belê ew bilindikirine pileyek berjortirê ji pileya swarê evîndar û heçkoheyî bû.

Herftina Sîstemê Derebegî

Dinav ewan fakterên mişe, yên li Ewropa rojava pişkdarî



di helweşîyana sîstemê derebegî da kirî, hevrikî û cengên dinav sazîya derebegî yê bixwe da bûn, ji ber ko sîstemê derebegî bo egerê lawazkirina desthelata navendîya şahanî, ew bû sedem, ko hevrikîyên çekdarî li navbera mîrên derebeg peyda bibin û desthelateka bilinda bihêz nebû, bişet sinûrekî ji bo peydabûna wan hevrikîyan danît. ew hevrikî jî ew bûn, ewan mîrên derebeg li dijî êk dikirin, her çende ew ceng ji heftîyan dirêjtir nedibûn, belê dubare nûdibûne ve, ji ber ko ew dibûne egerê têkçûna barê aşayşê û belavbûna karên kwiştin û dizî û wêrankarîyê li her derê, li Ferensa û Elmanîya û Îtalîya, her çende dijwarî û mişebûn ji deverekî bû êka dî cuda jî bît.

Li beramberî lawazîya desthelata navendîya şahanî, perstgehê bizavkirin snûrekî ji bo cengên mîran danît û aştî yê li Ewropa rojava belav biket, heta li çerxê dehê li salên (989-900)z, kombûyên qeşe nerazîbûna xwe li beramberî cengên navxueyê ragehandin û ji bo her kesê rêza aştîyê li welatî têkbidet, szayên xwe yên olî ragehandin, belê ew ceng ji bilî hukmên nerastewxwe yên li ser cengên deregî û pirotstokirina wan bûn.

Dako aramî di kertên abûrî da peyda bibît, peristgeh



berev (cengiragirtina xuday) çû, ko ew bi êk ji rêkan dihat hijmartin; yê ko perstgehê girtbûn, dako sinûrekî ji bo cengên derebegî danin û li sala 1041z zêdebarî (cengiragirtina xuday) ewa bi navê (aşîya xuday) bû, dako bikarin cengên dijwar rawestînin, bi behaneyê rêzê li rojên pîroz bigirin.

Li çerxê çardê û ji ber peydabûna binemayên rênîsîyansa Ewropî li ser çêbûy, herftin bi ser sîstemê derebegî da hat, her wesa dema dawîyê ji çerxên navîn gelek guhartin peydabûn, ko şoreşa bazirganî hate pêş û bajêr mezin bûn û pêşketin, çîneka nû bi navê (çîna navîn) dîyarbû, ko jîyana wan ne girêdayî erdî bû û ne dipêdivîbûn, wekî deymabên xwe yê benî milkeçî yê bo desthelat û stema derebegan biken, êdî netinê mîna berê erd jêderê berhemî û hîmê sermîyanî bû, nemaze piştî aşkirabûna cîhana nû û hatina zêrî.

Çîna navîn li Ewropa rojava rolekî xurt di lawazkirina desthelata derebegîyê da hebû, nemaze piştî ko desthelata vê çînê pitir û belav bûy, berijewendên wan (çîna navîn) hevdijî digel berjewendên desthelata derebegî hebûn, çunko gelek caran derebegan bizav dikirin astengan li ber



werar û pêşketina bazirganî danin, ya misoger bû; pêkdadan dinavbera wan da peyda bibît, çîna navîn ji bo xebata li dijî derebegan, ji bo xwe baştirîn hevkar şahên Ewropa dîtin, ew şahên divîyan desthelata xwe ya ramîyarî vegeînin û derebegan nehêlin.

Li demê benîyan destpêkirî berev karê bazirganî diçûn, hevgurên wan wênek nû bi jîyana azad dan, heta ko benîyan dest bi yaxî bûnê li ser baxuyê yên xwe kirin û (tevgerên gundan) pêkhînan û derebeg neçar man; li şûna mirovan gîyaneweran ji bo kêşana hevcarî û zivirandina xirxalên perwanên avê bikar bînin û ew bi êk ji xalên lawazên desthelata derebegî hate hijmartin

ewan pêşkeftinan, rêk li ber çîna navîn û şahanîyên netewî vekir, dirba dawîyê li rijêma derebegî biden, ew bû egera peydabûna cengan li beramberî perstgehê, ya rijêma derebegî diparst û ew ceng bi nemana heta hetayî ya wê rijêmî bidumahîk hatin:



Jêder

- ١- نعيم فرح، الحضارة الأوربية في العصور الوسطى، ط٢ (دمشق، ١٩٩٥).
- ٢- تاريخ الحضارات العام، ط٢ (بيروت، ١٩٨٦)، ج٣.
- ٣- هنري بيرين، تاريخ أوروبا في العصور الوسطى، ترجمة: عطية القوصي، (د/م، ١٩٩٦).
- ٤- نور الدين حاطوم، تاريخ أوروبا الوسيط في أوروبا، (د/م، ١٩٨٢)، ج١.
- ٥- ه.و. ديفز، أوروبا في العصور الوسطى، ترجمة: عبد الحميد حمدي محمود، ط١ (القاهرة، ١٩٨٥).
- ٦- عبد القادر احمد اليوسف، العصور الوسطى الأوربية، (بيروت، ١٩٦٧).
- ٧- محمد الخطيب، حضارة أوروبا في العصور الوسطى، (دمشق، ٢٠٠٦).
- ٨- محمد مظفر الادهمي، تاريخ أوروبا الحديث عصر النهضة-الثورة الفرنسية القرون ١٦-١٨ ميلادية، (بغداد، ١٩٨٩).

W: Mîro Beravî